DI ŞEPIRZEYÊ DE

Edîb Ebdula

Nuza ew cara çendê bû êk û du dîtî, ketbû davên viyanê, lê ya du dil bû, neku bawer ji çavên xwe nedikir... hema neya beraqil bû bişêt wî canê cehêl di hembêza hezkirinên xwe de bi xapînit, gelek caran jî di got: gencên me hema di serda çûyne, belku li dûf hayê dilê xwe û pariyên xweş diçin, li hindê digerin, nexasime eve yê duniye dîtiye nuke deh payz û buhar têkelkirîne...

Heke maç ji hevjînê mine çend careka min di bînit, bîra min lê diînte ve dibêjit nuke buhara li ser lêvên behra di çerînit, hema tu ya ji hizra xwe havêtî, rastî geleka ji rastiyê dûr nîne... eve pitir ji çar sale bi çar zaro ve bêyî semiyan hêlayne bi hîviya rehma hizra û têr xwarî û vexwarî û aram. Kî dibêjit bê diliya xwe dikit! Van hizra û gelekên dî pitir birînên wê hewdan govenda hizkirinên wê şarand kete di gomana nebes razîkirina wî da, bîriya bersifdanê kir, kadê çawa û li kûderê kerb û xerîbiya hinarên xwe hingêvit, lewra bi dengekê zîz got: boçî avên me jî ber lêf nabin, bi mifa nabin?.